

## Zimanê nijadperest

Bikaranîna vî zimanê qirêj li hemberî kurdan bêyî bê sizakirin her tim hat xelatkirin, li ser meseleyê piştî heqaretên Bursasporê, Bursaspor wekî qehreman hat îlankirin û ji aliyê gelek kesan ve ji bo Bursasporê pere hat komkirin... ***Hisên Çatikkaş/R.6***



## Kujer kî ye?

Peyva jinê her çiqas peyvek e ku zayendê diyar dike jî li gorî civak û kesan cuda cuda tê şîrovekirin. Hinek kes wê bi peyvên erênî, wek afirîner û xweşik, xwedî wijdan, edalet û exlaqê baş, aştîxwaz û li gel xwezayî-bûnê pênase dikin. Beşek girîng... ***Mulkiye Bîrtane/R.2***



## Aştî û pergala naskirinê

Aştî ne dawî ye, pêvajoyek e. Ew her roj, bi her gotin, bi her guhdarî û bi her gava biçûk tê avakirin. Aştî şertê mirovahiyê ye. Aştî ne tenê ew şert e ku em dikarin bi hev re bijîn, lê bi hev re bi rêz û bi hêvî bijîn. Her wiha, aştî ne... ***Prof. Dr. Abdulillah Polat/ R.8***


*29 Kanûn 2025 - 4 Çile 2026*
*Hejmar:* 315
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Sala hêvî û azadiyê

Endamê DBPê Bunyamîn Şeker der barê mîtînga ku dê li Amedê pêk bê got: “Em ê bi dirûşma ‘Azadiya Rêber Apo Azadiya Min e’ di 4ê çile de li Amedê ji bo mafê heviyê û azadî biqêrin.”

Di 4ê çileya 2026an, dê ji bo azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mîtînga Aştî û Hêviyê pêk were. Endamê meclisa DBPê Bunyamîn Şeker der barê mijarê de axivî û wiha got: “Divê hinek tişt rast werin xwendin û şîrovekirin. Kesek nikare azadiya Rêber Ocalan tenê wek azadiya şexsî bibîne û pênase bike. Em behsa azadiya rêberê gelekî dikin. Ew ne kesekî bi serê xwe ye, ew êdî kesayetekî gerdûnî ye. Divê ev wiha were xwendin û nirxandin. Ji ber vê yekê nêzîkatiya dewletê jî li gor vê tê guhertin. Divê dewlet di demeke nêz de vê nêzikatiya xwe biguherîne. Em hemû dizanin, di 27ê sibatê, ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve pêvajoyeke nû hat destpêkirin. Rol û misyona Ocalan a di vê pêvajoyê de careke din derket holê ku ji bo aştiyeke mayinde çiqas girîng e. Birêz Ocalan, 26 sal in li girava Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ji bo aştî û azadiya kurd û Kurdistanê bi her awayî rol û misyona xwe dilîze. Herwiha di vê pêvajoyê de derket holê ku bandora wî hem li ser gelan û hem jî li ser dewletan heye. Rêber Ocalan ne tenê wek Rêberê Gelê kurd tê pênasekirin.”




Bunyamîn Şeker di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Wateya vê mîtingê pir girîng e û berpirsyariya pêvajoya aştiyê dikeve ser milê gelê kurd û ya hemû galên ku li ser vê axê dijîn. Ji ber vê yekê divê tevli mîtînga mafê hêviyê bibin, qadê tijî bikin ku em hemû bi hev re bi yek dengî bang bikin û biqîrin da ku dewlet dengê me bibihîze ku azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan çiqas girîng e û tê çi wateyê. Bi vê mebestê em roja 4ê çileyê saet 12:00an li qada Îstasyonê li benda sedhezaran in. Em bi vê boneyê bang li hemû gelê kurd, her kurdekî welatparêz, her mirovên ku li ser axa Kurdistan û Tirkiyeyê dijî dikin. Em bang li kesên aştiyeke mayinde û azadiya xwe di azadiya Birêz Ocalan de dibînê dikin. Werin em bi hev re li azadiyê xwedî derkevin û biparêzin. Heta ku azadiya fizîkî ya Ocalan pêk neyê, aştiyeke mayinde jî çênabe. Bi vê mebestê em bang li hemû gelan dikin ku bi sedhezaran kes tevli mîtînga 4ê çile ya li qada Îstasyonê ya Amedê bibin û bi yek dengî biqîrin bibêjin: ‘Azadiya Rêber Apo Azadiya Min e’. Em hêvîdarin ku sala 2026an bibê sala mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo, gelê kurd û hemû mirovahiyê... ***Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4***

## 2025 ji bo hemû Kurdistanê yek bû

Sala 2025an ji bo kurdan bû saleke ku lêgerînên çareseriyê û zextên herêmî di heman demê de gihîştin lûtkeyê. Di bin bandora şerên li Rojhilata Navîn û guherîna hevsengiyên cîhanî de, kurd careke din bûn aktorên herêmê yên sereke. Sala 2025an, rewşa her parçeyê Kurdistanê her çiqas ji hev cuda be jî, di mijarên giştî de mesele yek bû. Li bakurê Kurdistanê di bin bandora krîza aborî û nîqaşên li ser “pêvajoyeke nû” de derbas bû. Tevî zextên siyasî, vîna gel a ji bo aştiyeke rûmetdar û çareseriya demokratîk bi hêz ma. Li Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî tevî gefên derve... ***Felemez Ulûg/R.6***

## Kurdkî ziwanê perwerdeyî û huquqî yo




Ziwan, tena silgirê têkilî nîyo; ziwan estbîyayîş, nasname û ruhê yew şarî yo. Tarîxê merdimayîye de, çinbiyayîşê yew şarî bi çinbiyayîşê ziwanê ci dest pêkeno. Seserra 21. de, dinya de heqê ziwanan sey heqanê bingeyîyan yenê qebulkerdiş, la ma vînenê ke welatê ma de hêrişê vera ziwanê kurdkî nêqedîyayê. Rojdemê peyênî de, çi Mehkemeya Antalya de qedexekerdişê ziwanî bo, çi vatişê siyasetmedaranê sey Dogu Perînçekî bo, nê heme nîşan danê ke zîhniyetê înkarî hema zî dewam keno. Labelê, raştîya ilmî, tarîxî û edebî vera nê îdîayan de sey koyêkê berzî vinderde ya. Dogu Perînçek û zîhniyetê qedexekerdişî wa baş bizanê; yew ziwan ke bi hezaran serran o Koyanê Munzurî, Sîpan û Cûdî de ciwîyeno, bi qerarê yew mehkeme an zî bi vatişê yew siyasetmedarî nêmireno... ***R.9***

## Divê kurd bi ser bikevin

Li rojavayê Kurdistanê rojên girîng tên jiyîn. Pêdiviya gelê Rojava bi serkeftinê heye. Wateya serkeftinê dîtina çareseriyeke domdar û mayinde ya bidestxistina mafên gelê kurd ên bingehîn e. Ev maf çi ne? Di serî de mafê misogerkirina jiyanê ye. Jiyana gelê kurd hîn jî di bin xetareya mirin, girtin û sirgûnkirinê de ye. Ji aliyekî ve dewleta tirk, ji aliyekî ve hikûmeta Colanî û çeteyên tev lê bûne her roj gefa tinekirinê li gel dixwin. Roja terorîstên DAIŞê hatin Rojhilata Navîn û êrîş birin ser kurdan, divê kurd rabin û rûnên û dua bikin, ku hêzeke wan a birêxistinkirî ya çekdar hebû û li Kobanê pişt li wan... ***Hesen Huseyîn Denîz/ R.7***

# Kujer kî ye?

**Peyva jinê her çiqas peyvek e ku zayendê diyar dike jî li gorî civak û kesan cuda cuda tê şîrovekirin. Hinek kes wê bi peyvên erênî, wek afirîner û xweşik, xwedî wijdan, edalet û exlaqê baş, aştîxwaz û li gel xwezayîbûnê pênase dikin. Beşek girîng û mezin a civakê jî hemû taybetmendiyên paşverû yên ku heqeretê li jinan dikin, bi wê ve girêdidin**



Mulkiye Bîrtane



Di van demên dawî de gelek nîqaş, şîrove û nirxandin li ser gotina kujerê kastîk a ku ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve hatiye rojevê, tên kirin.

Kujer/qatîl kî ye, yan jî kujerî çi ye, çawa cihê xwe wisa zexm û xurt kiriye, ji nû ve tê pênasekirin. Di dîrokê de bi zanebûn kuştina kesan çawa dest pê kiriye? Gelo wisa ji nişka ve yan jî bi demê re derketiye holê?

Çi em ji perspektîfeke olî ve, çi jî ji perspektîfeke zanistî li mijarê binêrin, bêguman aşkere ye ku pir kûrtir e. Ev mesele ne tenê kuştina mirovan e, di heman demê de hişê kuştin, wêrankirin, talankirin tunehesibandin, desteserkirin, înkarkirin, binpêkirin, bi giştî hemû cureyên serdestiyê ye. Êdî bûye pergaleke desthilatdariyê. Ev pergal jî bi hemû nîşaneyên ku em di jiyana xwe de dibinin û dijîn, diyar dikin ku hêdî hêdî gerstêrka me ber bi tunekirinê ve dibe. Ev tiştên ku me rêz kirin, hemû êriş û kiryarên xirab ên li dijî jiyana mirovahiyê û cîhanê ne. Bi kurtasî gava ku em li kujerê kastîk bigerin divê kiryarên meran binêrin. Ji hêla olî ve cara ewil kuştina mirovekî bi destê kesekî herî nêz ve pêk hatiye. Qabîl, kurê Adem û Hewayê, birayê xwe Habîl ji ber çavnebariyê kuşt. Ev hesûdî û kujerî ji wê demê heta niha berdewam e. Hêrs û hesûdiya meran a li hember jinan jî jiyana mirovahiyê xera kir.

Bi gelemperî tê qebûlkirin ku jiyana li ser erdê beriya 3,5 milyar sal berê ye. Li gorî agahiyên ku ji kolandin û lêkolînên arkeolojîk hatine bidestxistin jî, îro dîroka mirovahiyê diçe heta 200-300 hezar sal berê.

Li gorî daneyan, di destpêkê de jiyan wekhev û aram bû. Ev jî bi destê jinan hatibû avakirin û parastin. Paşê ev jiyan gav bi gav guherî û niha em dibînin ku di her warî de jiyan tê tehdîtkirin. Ger tedbîr neyên wergirtin, encam pir xeternak xuya dibe û ber bi qonaxeke nebaş ve diçe.

Jinên k u nebat û ajal kedî dikirin, xwarin û vexwarin û amûr û alavên pêwîst peyda dikirin, jiyaneke rehet û xweş afirandibûn. Vê jiyanê bi hezaran salan wisa dewam kir û 'Pergala Xwedawendan'ava bû. Civak ji aliyê jinan ve dihat birêvebirin. Ev yek jî bû sedema çavnebariya mêran.

Di wê pêvajoyê de, mêr jî li cihê xwe wisa destevala nedisekinîn. Raman û kirinên wan ne ji bo xêra civakê bûn. Bi danîna dafikan zirar dan xwezayê, bi rêya nêçîrê fêrî kuştina ajalan bûn û pê re jî ya mirovan. Bi demê re ji bo xwe jiyaneke serdest ava kirin.

Zilamê ku ji pergala xwedawendiyê aciz bû, çav berda hemû berhem û destkeftiyên jinan û ew bi tevahî xist bin kontrola xwe. Wî, di kesayeta jinê de, bi zordarî û kuştina jinan, tundûtûjî, koletî li seranserê civakê belav kirin. Pergala serdestiyê ya ku ev herî kêm şeş hezar sal in li nav civakê misoger bû, ev du sed sal in jî ji aliyê netewe-dewletan ve li ser civakê bi awayekî dijwar didome. Li mal, dibistan, kargeh û di her asteke civakê de em pê re rûbirû dimînin.

Bi rastî jî me dîroka tunehesibandina ked û hebûna jinan û pergala serdestiyê wisa dizanibû. Lê gelo bi rastî vê pergalê kengî dest pê kir?

Dîsa lêkolînên arkeolojîk zanînên me yên der barê koletî û bibdestiya jin û civakê ku me heta niha dizanibû, serûbin kirin. Dîroknas, arkeolog, antropolog û hemû şaxên zanistê yên ku bi mirovahiyê re eleqedar in, dibêjin ku dîroka koletiyê û sîstemên serdestiyê herî kêm 30 hezar sal berê dest pê kiriye. Di her serdemê de jî şiklê xwe guhertiye û hatiye roja me ya îroyîn.

Ji ber ku di cewherê vê pergala kujertiyê de hişekî kuştina mirov û ajalan, wêrankirina cih û waran, talankirina xwezayê, tunehesibandin û qirkirina hemû giyanberan, desteserkirina hemû destkeftiyan, înkarkirina nasnameyan, binpêkirina maf û azadiyan heye, îro rewş wisa giran bûye.

Roj nîn e ku em kuştinên kesan bi taybetî jî yên jinan nebihîzin. Kuştina jinan ewqas zêde bûye ku veguheriye asta jenosîda zayendî. Çima?

Divê em bi kurtasî li ser peyva 'jin'ê bisekinin. Peyva jinê her çiqas peyvek e ku zayendê diyar dike jî li gorî civak û kesan cuda cuda tê şîrovekirin. Hinek kes wê bi peyvên erênî, wek afirîner û xweşik, xwedî wijdan, edalet û exlaqê baş, aştîxwaz û li gel xwezayîbûnê pênase dikin. Beşek girîng û mezin a civakê jî hemû taybetmendiyên paşverû yên ku heqeretê li jinan dikin, bi wê ve girêdidin. Bo nimûne; ew di bin desthilatdariya zayenda dijber (mêr) de kesayeteke qels e, bêhêz û bêîrade ye. Kesa ku keda wê bi hêsanî tê îstîsmarkirin; kole û karkera nava malê ye. Wek makîneya ku her tim zaroka bîne dinyayê û ji her tiştî wêdetir jî namûsa malbat û mêr e. Dibe ku van hemûyan têrî nekiribin, di dîrokê de wek sembola xerabiyê; sêrbaz hatiye binavkirin û paşê jî hatiye şewitandin. Bi vî awayî çi baş çi nebaş, jin her gav li navenda jiyanê cihê xwe girtiye.

Dema ku em li ser van têgînan yekbiyek bisekinin, mirov neçar e ku qala hebûneke mezin bike. Jin, ku hem ji hêla jêhatîbûn hem jî ji hêla hejmarê ve nîvê, yan jî belkî ji nîvî zêdetir nifûsê pêk tînin, hê jî di bin zextê de ne û komkujiyeke mezin li ser zayenda wan pêk tê.

Li ser vê şîroveyê divê em pirseke din bipirsin. Bi ewqas hejmareke mezin ji bo çi jin nikarin li hember vê zilmê bi ser bikevin? Ji ber ku di rastiyê de ne tenê jin tên kuştin, pê re hemû civak jî tê kuştin û zirarê dibîne. Ev pergala desthilatdariyê wisa hatiye honandin ku hevsengiya civak û jiyanê têk çûye û kes newêre dengê xwe bike. Ji bo berjewendiyên xwe bi mêjiyekî qirêj û kujer 'pergala kastîk' ava kiriye. Hemû mirovahî bi kodên nebaş ên vê pergalê ku bi hezaran sal in li nav civakê bi cih bûne, perwerde bûn. Xwerizgarkirina ji van kodan ge lekî zehmet e û demê dixwaze. Lê jin çawa di her serdemê de bi kodên xwe yên xwedawendiyê tevgeriyane, dîsa ji bo rizgariya tevahî civakê bar dikeve ser milê wan ku pêşengiya civakê bikin. Li vir peywira veguherîna mêjiyê meran jî ya jinan e. Ji ber ku mesele ya tevahiya mirovahiyê ye, jin tenê nikarin vî barî bigirin ser milê xwe, mêr jî mecbûr in bi wan re bikaribin têbikoşin. Wê demê dê jiyaneke hevbeş, hevpar û azad bê afirandin…

# Di şerê dewletê de înfazkirina heqîqeta jinan



Medya Bal



Şer ne tenê pevçûnek di navbera hêzên çekdar de ye. Ji perspektîfa pergala dewletan ve, şer ji bo ji nû ve şekildan û bindestkirina civakê amrazek bingehîn e. Ji ber vê yekê, armanc ne tenê qadên fizîkî ne, di heman demê de bîra civakî, nirxên exlaqî û îradeya kolektîf in jî. Jin ji ber xwezaya xwe di navenda van qadan de ne. Hebûna jinan, ku jiyanê ji nû ve diafirîne, civakê didomîne û îhtîmala rêzikek alternatîf hildigire, dibe hedefa şer a sereke.

Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar di qedexeya derva ya li Silopiyayê de di 4ê çileyê de ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin. Kuştina Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar li Silopiyayê, nîşandana vê rastiya dîrokî ya hemdem e. Kuştina Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar bi awayekî zelal nîşan dide ku stratejiya şer a jiholêrakirina tevna civakî li ser jinan tê meşandin.

**Kuştina wan ne tesaduf e**

Ew hersê jin ne qurbaniyên şer ên tesadufî ne. Ew sembolên tundiya dewletê ne ku jinan hedef digirin. Rastiya ku di vê bûyerê de derket holê careke din nîşan dide ku şer pêşî û bi israr li dijî jinan tê meşandin.

Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar xwedî pozîsyonên civakî yên cuda bûn. Yek li qada siyasî, yek di têkoşîna rizgariya jinan de û yek jî li jiyana sivîl li ber xwe dida. Lê belê, ji bo dewletê û perspektîfa wê ya tundiyê, ev cudahî ne girîng bûn. Xala hevpar ew bû ku ew jin bûn.

Ji bo zîhniyeta şer a ku ji hêla dewletê û mêran ve tê birêvebirin, jin an wekî qurbaniyên pasîf tên pejirandin an jî wekî gefek tên dîtin ku divê ji aliyê hişmendî ve bi temamî ji holê werin rakirin. Her deverek ku jin dibin xwedî deng û hêza biryardanê, dibin hedefa rasterast a mîlîtarîzmê. Kuştina jinan li Silopiyayê encamek berbiçav a vê zîhniyetê ye.

**Nakokiya navbera jiyan û wêrankirinê**

Mîlîtarîzm bi rêya wêrankirinê hebûna xwe didomîne. Jin jî bi hebûna xwe jiyan û berdewamiya aramiyê temsîl dike. Ev her du rastî nikarin bi hev re bijîn. Ji ber vê yekê, li her dera ku azadiya jinan xurt dibe, hişmendiya mêrperest şerê xwe yê li dijî wê kûrtir dike. Li her dera ku şer kûrtir dibe, beden û îradeya jinan hedef tê girtin. Bi jinan re hemû civak dibe hedefa hişmendiya mêrperest.

Kuştina Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar mînakek hemdem a vê nakokiya dîrokî ye. Ev êrişa li ser rastiya jinan krîza rewatiya şer jî aşkere dike.

Li nav kurdan bi hezaran kesan di rêya têkoşîna azadiyê de canê xwe dane. Bîranîna wan kesan ji bo kurdan ne tenê bîranîneke jirêzê ye. Ji ber vê yekê bîranîna Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar ne tenê kiryarek şînê ye. Ew di heman demê de îfadeya îradeya aşkerekirina tundiya sîstematîk e ku ji hêla zîhniyeta şer a dewletê ve li dijî jinan tê kirin. Tişta ku di şexsê wan de hat hedefgirtin alternatîfa civakî bû ku di bin pêşengiya jinan de geş bû.

Navên Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar bîranîna êrişa dîrokî ne ku bi şerê li dijî jinan pêk hatiye. Ji ser mirina wan re 10 sal derbas bûn. Armanc ew bû ku wan bêdeng bikin; lê belê, rastiya ku wan li dû xwe hişt, wekî şahidiyek nayê vemirandin dijî.

2026 Pîroz Be

Sala 2026an wê bibe sala aştî, wekhevî û bi hemû kesên ku baweriya xwe bi civaka komûnal a demokratîk anî re, bibe saleke berxwedanê. Berxwedana ku bi nasnameya jina azad em dimeşînin, ew berxwedan e ku jiyanê diparêze, civakê diguherîne û pêşereke azad û wek hev ava dike.
Em ê di sersala nû de ji bo avkirina aştî, azadî û wekheviyê rêya xwe bidomînin. Em bi wê hêviyê ne ku sala 2026an ji hemû jin û gelan re aştî û azadiyê bîne.

TJA
TEVGERA JINÊN AZAD

# Girtîgeh bûne navenda îşkenceyê

Di rapor û belgeyan de tê dîtin ku girtîgehên li Tirkiye û bakurê Kurdistanê bûne navenda îşkenceyê. Girtiyên nexweş nayên dermankirin, girtiyên ku cezayên wan xelas bûne jî nayên berdan

Mehmet Alî Ertaş

Li gorî rapora komîsyona navendî ya ÎHDê ya 7ê Nîsana 2025an, li hemû girtîgehên Tirkiye û bakurê Kurdistanê herî kêm hezar û 412 girtiyên nexweş hene. Ji van girtiyan 335 girtî rewşa wan pir giran e û divê demildest bên berdan. 230 girtî bi tena serê xwe nikarin bijîn. Divê li nexweşxaneyên taybet bên dermankirin. Li gorî rapora MED TUHAD-FEDê ya hezîranê li seranserî welat ji 115 girtîgehan nêzî 3 hezar û 500 girtiyan serlêdan kiriye. 631 girtiyên nexweş serî li MED TUHAD-FEDê daye. Li gorî raporê; 359 girtî berdana wan tê astengkirin. 200 girtiyên ji Rojava û Rojhilat hene. Lê ji ber ku ji statuya hemwelatiyê bêpar in; ji temînkirina parêzeran heta hevdîtinên bi malbatan re, ji her mafên xwe yên sereke bêpar in. 400 girtî di hucreyên yekkesî de tên ragirtin.

**Girtiyên nexweş nayên dermankirin**

Hevberdevka Komîsyona Girtîgehan a Şaxa ÎHDa Îzmirê Nazli Turan, bal kişand ser binpêkirinên mafên girtiyên li girtîgehên herêma Egeyê û got: "Zext û binpêkirinên li girtîgehên Egeyê ji herêmên din ên Tirkiyeyê ne cudatir e. Şaxa ÎHDê ya Îzmirê gelek serlêdanên têkildarî binpêkirina mafên girtiyan werdigirin. Mafê girtiyan ê tenduristiyê tê binpêkirin. Girtî dema diçin nexweşxaneyê tên astengkirin. Wan bi kelepçeyan mueyne dikin. Derman û xwarina ku pêdiviyên wan pê heye, nadin wan. Ev nexweşiyên kronîk zêde dike. Mafê girtiyan ên ragihandinê tên binpêkirin. Bi awayekî keyfî nameyên girtiyan nadin wan. Girtiyan ji malbatan dûr dixin. Sewqî girtîgehên dûr dikin. Girtiyan tecrîd û îzole dikin. Zêdeyî kapasîteyê girtiyan di menzelan de didin ragirtin. Mafên girtiyan ên civakî û sporê asteng dikin. Rastî lêgerînên keyfî tên."

Parêzer Nazli Turan bi bîr xist ku hemû binpêkirinên mafan nayên dîtin û wiha axivî: "Qanalên ragihandina derve bisînor in. Girtî nikarin hemû binpêkirinên mafan bi raya giştî re parve bikin. Tenê dikarin bi rêya parêzer û malbatan balê bikişînin ser binpêkirina mafan. Girtî heta ku binpêkirina mafan bi saziyên civakî, parêzer, malbat û rêxistinên mafan re parve dikin gelek zahmetiyan dijîn. Nameyên girtiyan têne sansurkirin an jî astengkirin. Hin girtî jî newêrin qala binpêkirina mafan bikin. Dema balê dikişînin ser binpêkirina mafan, rastî cezayê dîsîplînê tên. Ev binpêkirinên mafan bi israra hewldana parêzer û malbatan tên dîtin û xuyakirin."

Nazli Turan bal kişand ser têkoşîna li dijî binpêkirina mafan û wiha pêde çû: "Her serlêran û agahiya der barê binpêkirina mafan de em lêkolîn dikin. Belge û raporan kom dikin û têkildarî van binpêkirinan em serî li rayedarên eleqeder didin."

Nazli Turan li ser encama têkoşînê jî rawestiya û wiha domand: "Em di gelek serlêdanan de encam werdigirin. Hin serlêdan û hewldanên me bêcam dimînin. Lê ji bo parastina mafan hewldanên me didomin. Serlêdanên ku em ji wan encamê werdigirin hêvî û têkoşîna me xurttir dikin."

Nazli Turan der barê hewldanên Komîsyona Mafên Mirovan a Meclisê de jî û wiha got: "Komîsyona meclisê jî venêrtinê dike. Lê venêrtinek xurttir û bi rêk û pêktir ku encamê dide şert e."

Nazli Turan, li ser tişta ku malbat û parêzer bikin jî rawestiya û got: "Divê hiqûqnas hemû binpêkirinên mafan ku derdikeve pêşberî wan belge bike. Divê bêyî ku dereng bimîne serlêdanên hewce bike. Divê malbat bi parêzeran û saziyên sivîl re bi rêk û pêk di nav temasê de be. Çiqas malbat bi parêzer û saziyên civakî re di nav temasê de be bêtir encamê werdigire."

Nazli Turan herî dawî rewşa girtiyên nexweş jî bi bîr xist û wiha bi dawî kir: "Hefteyên borî ÎHDa Îzmirê bal kişand ser girtiyê nexweş Mehmet Saît Yildirim. Mehmet Saît Yildirim 74 salî ye û 30 sal in girtî ye. Di lîsteya girtiyên nexweş de ye. Lijneya Çavdêriya îdarî cara duyemîn berdana wî taloq dike û nayê berdan. Ji ber poşmaniyê qebûl nake berdana wî taloq dikin. Divê serbet bê berdan. Lê nayê berdan."

2026 Pîroz Be

Di sala 2025an de jî wek rojnameger em rastî gelek binpêkirinên mafan hatin. Em wek rojnamegerên ku tevî van êrişan li ser karên xwe ne hêvî dikin ku di 2026an de tu mafên mirovî û pîşeyî neynê binpêkirin.

Sersala we pîroz be.

DFG
Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê

2026 Pîroz Be

Em wekî Komeleya Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê (MKG) hêvî dikin sala 2026an bibe wesîleya aştî, azadî û demokrasiyê. Bila di vê sala nû de hemû rojnameger bigihêjin azadiya xwe û bikaribin di qadeke azad de pîşeya xwe bidomînin.
Dê têkoşîna me ya ji bo şopandina heqîqetê û ji bo aştî, azadî û demokrasiyê bidome.

MKG
Komeleya Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê

## AZADIYA ABDULLAH OCALAN AZADIYA CIVAKÊ YE

# Ocalan kesayeteke gerdûnî ye

■ Xecê Şen

*Di 10ê cotmeha 2023yan de bi pêşengiya rewşenbîr, hunermend, akademîsyen û alîgirên Tevgera Azadiyê ji bo azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kampanyayek hat destpêkirin. Ev kampanya hê jî li gelek welatên biyanî bi çalakiyên cihêreng berdewam e. Li her çar aliyên Kurdistanê jî, bi taybetî li Bakur, gelek çalakiyên cuda; meş, mitîng, komxebat û konferans hatin lidarxistin.*

*Herwiha, bi pêşengiya DEM Partî, DBP û TJAyê, komeke ku ji 75 kesan pêk dihat, ji 1ê sibatê heta 15ê sibata 2024an bi dirûşma 'Em ji bo Azadiyê Dimeşin, Dem Dema Azadiyê ye' li ser xetên Botan û Serhedê, bajar bi bajar geriya û bi gel re civîn û hevdîtin pêk anîn. Tevgera Jinên Azad TJAyê jî, 29ê îlona 2025an, bi dirûşma 'Em bi Hêviyê ber bi Azadiyê ve dimeşin' ji Amedê heta Enqereyê meşiyan.*

*Herî dawî jî, 4ê çileya 2026an, tê payîn ku bi tevlîbûna bi dehhezaran mirovan li qada Îstayona Amedê mitînga mafê hêviyê bê lidarxistin.*

*Em der barê mitînga mafê hêviyê ya ku dê, 4ê çileya 2026an, li Amedê were lidarxistin, endamê meclisa Partiya Herêmên Demokratîk DBPê parêzer Bunyamîn Şeker re axivîn.*



Endamê meclisa Partiya Herêmên Demokratîk DBPê parêzer Bunyamîn Şeker diyar ku ew di mitînga Amedê de li benda sedhezaran kesî ne û got: "Em ê bi dirûşma 'Azadiya Rêber Apo Azadiya Min e' 4ê çileyê saet 12:00an li qada Îstasyonê ya Amedê mitînga herêmî li dar bixin û li benda sedhezaran kesî ne."

***Hûn ê li Amedê mitîngekê li dar bixin. Dirûşm û armanca mitînga we çi ye?***

Em bi dirûşma 'Azadiya Rêber Apo Azadiya Min e', 4ê çileyê saet 12:00an, li qada Îstasyona Amedê mitînga herêmî li dar bixin. Armanca mitîngê jî azadiya fizîkî ya Birêz Abdullah Ocalan e. Ji bo ku dewlet biryara mafê hêviyê bike meriyetê, em vê mitîngê li dar dixin û em hemû xebat û amadekariyên xwe jî bi vê armancê dikin. Mitîng ji navê jî diyar e; 'Mitînga Hêvî û Azadiyê'.

***Mebest ji 'mafê hêviyê' çi ye? Wek hiqûqnasekî hûn dikarin vê mijarê binirxînin?***

Mafê hêviyê nîqaşeke îro nîn e. Sala 2014an Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropa (DMME) der barê biryareke xwe ya ji bo azadiya Birêz Ocalan de got: "Kesekî girtî heta dawiya emrê xwe ne pêkan e ku li girtîgehê bimîne û ev binpêkirina mafên mirovan e. Mayina kesekî heta dawiya emrê xwe li girîgehê, îşkence ye û li dijî peymana mafên mirovan a navneteweyî ye. Pêwîst e dewlet mekanîzmayekê saz bike û di wê mekanîzmayê de kesên ku cezayên giran girtine bizanibin ku dê rojekê ji girtîgehê derbikevin, tev li jiyana azad a fizîkî bibin û wê bikaribin li nav cavakê bijîn." DMMê piştî vê biyara mafê hêviyê, ji bo Tirkiyeyê çend biryarên din jî wergirtin, lê mixabin ew jî ji aliyê Tirkiyeyê ve careke din hatin îhmalkirin. Ango ji 2014an ve û heta niha ti gaveke şênber nehatiye avêtin. Ev du sal in saziyên sivîl ên wek ÎHD, OHDê û saziyên hiqûqê ji bo mafê hêviyê serî li Konseya Wezîrên Ewropayê da. Ji ber ku Tirkiye jî aligireke vê konseyê ye. Herwiha Konseya Ewropayê serlêdana saziyên hiqûqê qebûl kir û biryara mafê hêviyê ji nû ve nirxand û ji bo pêkanîna biryara mafê hêviyê jî dem da Tirkiyeyê. Konseyê ji Tirkiyeyê re got ku divê tu mekanîzmayekê saz bikî û di wê mekanîzmayê de kesên xwedî cezayê giran ên muebetê, tev bên berdan. Her çiqas destêkê ev biryara mafê hêviyê ji bo Birêz Ocalan hatibe dayîn jî, ev biryar ji bo hemû girtiyên xwedî cezayên giran derbasdar e. Lê niha li Tirkiyeyê li hemû girtîgehan lijneya çavdêriyê ya îdarî û zagona înfazê hatiye avakirin. Dewletê qaşo ev wek mekanîzmayekê saz kiriye. Lê mekanîzmaya ku Konseya Ewropayê dibêje û ya ku îro li Tirkiyeyê hatiye sazkirin ne heman tişt in û li vir binpêkirina mafên mirovan zêde heye. Lijneya çavdêriyê ya îdarî û zagona înfazê ku Tirkiyeyê ew saz kiriye, wek dozgeriyê tevdigere, bi sedan kesan bi hinecetên cuda ceza dikin. Ango bi biyarên vê mekanîzmayê mafê azadiya girtiyan tê astegkirin; înfazên wan tên şewitandin, tehliyeyên wan tên taloqkirin. Ev jî fikarên ku me gelek caran anîbûn ziman piştrast dike. Wek hiqûqnasan me gelek caran nirxandin û me serî li gelek cihên cuda da. Herwiha Konseya Ewropayê ji bo mafê hêviyê careke din dem da Tirkiyeyê ku mekanîzmayeke şênber û pratîze bibe saz bike. Lê mixabin heta niha jî gaveke şêber û berbiçav nehatiye avêtin.

***Azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dê bandoreke çawa li ser gelan bike?***

Bi rastî divê hinek tişt rast werin xwendin û şîrovekirin. Kesek nikare azadiya Rêber Ocalan tenê wek azadiya kesekî bibîne û pênase bike. Em behsa azadiya rêberê gelekî dikin. Ew ne kesekî bi serê xwe ye, ew êdî kesayetekî gerdûnî ye. Divê ev wiha were xwendin û nirxandin. Ji ber vê yekê nêzîkatiya dewletê jî li gor vê tê guhertin. Divê dewlet di demeke nêz de vê nêzîkatiya xwe biguherîne. Em hemû dizanin, 27ê sibatê, ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve pêvajoyeke nû hat destpêkirin. Rol û misyona Birêz Ocalan a di vê pêvajoyê de careke din derket holê ku ji bo aştiyeke mayinde çiqas girîng e. Birêz Ocalan ji 1999an vir ve, 26 sal in li girava Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ji bo aştî û azadiya kurd û Kurdistanê, hem jî ji bo tavahiya gelan û bi taybetî jî ji bo Rojhilata Navîn bi her awayî rol û misyona xwe dilîze. Herwiha di vê pêvaşoyê de derket holê ku badora wî hem li ser gelan û hem jî li ser dewletan heye. Rêber Ocalan ne tenê wek Rêberê Gelê Kurd tê pênasekirin, di konferansê de jî derket holê, îro hemû cîhan li banga wî guhdarî dike. Fîlozofên cîhanê jî fikrên wî wek ronahiya xwe dibînin û pênase dikin. Birêz Ocalan dema ku 27ê sibatê banga dîrokî ya aştî û civaka demokratîk kir, çapemeniya cîhanê banga wî şopand û li ser banga wî nirxandin kirin. Dîsa ji Netewêyên Yêkbûyî, ji Çînê heta Amerîka û Almanyayê daxuyanî dan û piştgiriya xwe ya ji bo banga aştî û civaka demokratîk diyar kirin. Em vê pir girîng dibînin. Ev daxuyaniyên van welatan careke din nîşan da ku bandora Birêz Ocalan çiqas li ser cîhanê heye. Lewra ji bo ku ev pêvajo bigihîje armanca xwe, cîhaneke bêşer were avakirin û aştiyeke mayinde li Tirkiyeyê, Rojhilata Navîn pêk were, Birêz Ocalan bikaribe rol û misyona xwe hê bêhtir bilîze, azadiya wî ya fizîkî şert e û divê demildest biryara mafê hêviyê pêk were.

***Ji bo biryara mafê hêviyê pêk were, divê çi bê kirin?***

Ger ji hêla siyasî ve fikarên dewletê hebin jî, ji hêla hiqûqî ve rê û rêbazên wê hatine avakirin. Ango ew derfetên dewletê hene ku mafê hêviyê pêk bîne. Tenê xalên ku Dadgeha Mafên Mirovan danîne pêşiya dewletê pêk werin bes e. Ev tiştekî ne zehmet lê pir hêsan e. Ji ber ku Birêz Ocalan 26 salên xwe tijî kiriye û êdî dem hatiye ku demildest azadiya wî ya fizîkî pêk were.

Bi vê mijarê ve girêdayî ji bo azadiya Birêz Abdullah Ocalan, 10ê cotmeha 2023yan, dost û hevalên tevgera azadiyê yên biyanî, rewşenbîr, hunermend û akademîsyenan kampanyayek da destpêkkirin û ji du salan zêdetir e ku kampanya berdewam e. Ev kampanya li gelek welatan deng veda û gelek kesan jî bi peyam, daxuyanî, meş, name û hwd piştgirî da kampayaya azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan. Dîsa ji 27ê sibata 2024an heta niha pêvajoyeke aştî û civaka demokratîk hatiye destpêkirin û ev pêvajo ji bo azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan jî pir guncav e. Lê dewletê heta niha ji bo mafê hêviyê gaveke şênber neavêtiye. Dewlet Bahçelî got; "Divê bangawaziyek bê kirin ku em jî biyara mafê hêviyê pêk bînin." Lê îro em dibînin ku dewlet Bahçelî dibêje; "Birêz Ocalan bixwe naxwaze ji grava Îmraliyê derkeve." Vê ji bo çi dibêje? Birêz Ocalan di daxuyaniya 10ê tirmehê de anîbû ziman: "Azadiya Min Bi Azadiya Civakê ve girêdayî ye." Rast e, ev ne cara yekemîn e ku Birêz Ocalan vê gotinê dike û wî gelek caran di peyam, manîfesto û parêznameyên xwe de ev pênase bi zelalî kiriye. Lê belê divê em jî vê yekê ji bîr nekin ku azadiya civakê jî bi azadiya Birêz Ocalan ve girêdayî ye. Heta ku "Ew Azad Nebe Civak jî Azad Nabe' gel û Rêbertî bi hev re girêdayî ne. Ji bo ku em bigihîjin azadiya xwe divê ev pêvajo bi ser bikeve. Ji bo ku ev pêvajo bigihîje armanca xwe pêwîst e Birêz Ocalan bi awayekî fizîkî azadiya xwe bi dest bixe. Eger ev şert û merc pêk neyên em ê çawa behsa azadiya civakê bikin? Ev berpirsyarî dikeve ser milê me hemûyan. Di serî de gelê kurd, dost û mirovên demokrat û hemû gelên azadîxwaz xwe li hemberî serkeftina pêvajoyê berpirsiyar bibînin. Ji ber vê yekê ev mitînga me pir girîng e.

***We ji bo mitîngê heta niha çi xebat kirine û amadekariyên we çi ne?***

Ji bo mitîngê hemû hevalên me li qadan xebatên xwe dikin û di rojeva hemû saziyên me de mitînga azadiyê ya 4ê çileyê heye. Ji bevlavokan heta afîşan, ji xebatên taxan bigirin heta malan tê meşandin. Her wekî ku min anî ziman, yek dîrûşma mitîngê heye ew jî azadiya fizîkî ya Serokatî ye. Ev mitîng bi vê mebestê tê li dar xistin. Ji ber vê sedemê em li vê mitîngê wek konserekê nanêrin. Divê qada mitîngê tijî bibe û sed hezaran kes li wir bin ku wateya wê derkeve holê. Em ji bo wê dixebitin û dê di mitîngê de jî peyamên girîng bên dayîn. Ev mitîng, ne mitîngeke ji rêzê yee.

***Di mitîngê de dê kî biaxive û kîjan hunermend derkevin ser dikê?***

Di mitîngê de wê gelek siyasetmedar, rêhevalên Birêz Abdullah Ocalan ku wek sekreterya ji grava Îmraliyê hatin berdan, Veysî Aktaş, Çetîn Arkaş, aktîvîsta TJAyê Ayla Akat Ata, Leyla Zana, her du hevserokên giştî yên DBPê Çigdem Kiliçgun Uçar, hevaserokê giştî yê DEM Partiyê Tûncer Bakirhan wê derkevin ser dikê biaxivin. Bêguman dê axaftin li ser esasê azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan bin û peyamên girîng ên ji bo mafê hêviyê bên dayîn.

***Herî dawî banga we ya ji bo mitîngê çi ye?***

Wateya vê mitîngê pir girîng e û berpirsyariya pêvajoya aştiyê dikeve ser milê gelê kurd û ya hemû galên ku li ser vê axê dijîn. Ji ber vê yekê divê tevli mitînga mafê hêviyê bibin, qadê tijî bikin ku em hemû bi hev re bi yek dengî bang bikin û biqîrin da ku dewlet dengê me bibihîze ku azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan çiqas girîng e û tê çi wateyê. Bi vê mebestê em roja 4ê çileyê saet 12:00an li qada mitîngê li benda sedhezan in. Em bi vê boneyê bang li hemû gelê kurd dikin ku, her kurdekî welatparêz, her mirovekî dikin ku li ser axa Kurdistan û Tirkiyeyê dijî û ji bo aştiyeke mayinde û azadiya xwe di azadiya Birêz Ocalan de dibîne. Werin em bi hev re li azadiyê xwedî derkevin û biparêzin. Lewra heta ku azadiya fizîkî ya Birêz Ocalan pêk neyê, li vî welatî aştiyeke mayinde jî çênabe. Ev heqîqetek e. Bi vê mebestê em bang li hemû gelan dikin ku ji Serhedê heta Botanê, ji Amedê heta Anatolyaya Navîn û Tirkiyeyê bi sedhezaran kes tevli mitînga 4ê çile ya li qada Îstasyonê ya Amedê bibin û bi yek dengî biqîrin bibêjin: 'Azadiya Rêber Apo Azadiya Min e'. Em hêvîdarin ku sala 2026an bibê sala mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo, gelê kurd û hemû mirovahiyê.

MED TUHAD-FED

# 2026 Pîroz Be

MED TUHAD-FED

Em di vê pêvajoyê de neheqiyên ku li girtîgehan diqewimin dibînin.
Em hêvî dikin ku ev pirsgirêk bi rêya diyalogê bên çareserkirin.
Em hêvî dikin ku di vê pêvajoyê de aştî bi hêztir bibe,
mafê jiyan û tenduristiyê were mîsogerkirin.
Em bi hêviya azadî û wekheviyê sersala 2026an pîroz dikin.

**Federasyona Komeleyên Piştevaniya Hiqûqî ya Malbatên Girtî û Hikumxwaran (TUHAD-FED)**

# 2026 Pîroz Be

Bi hêviya û baweriya ku sersala 2026an bibe
wesîleya pêkhatina hemû daxwaz û hêviyên hemû gelên bindest.
Bi hêviya ku ev sal bibe destpêka rojên xweş û azad. Kurd jî wekî hemû
gelên cîhanê bi aramî, azadî û xweşî sersal û cejnên xwe pîroz bikin.
Bila di sala nû de li şûna şer; aştî û diyalog serwer bibe.
Li şûna pêkutî û zordestiyan wekhevî, azadî û demokrasî serwer bibe.
Bi van hêvî û daxwazan em sersala hemû gelên cîhanê pîroz dikin.

**Komeleya Piştevanî, Yekîtî û Çandê ya Malbatên Xizmên Windayan (MEBYA-DER)**

# Zimanê nijadperest aştiyê bi pêş naxe

Bikaranîna zimanê qirêj li dijî kurdan bêyî bê sizakirin her tim hat xelatkirin, li ser meseleyê piştî heqaretên Bursasporê, li şûna sizakirkinê ew qehreman îlankirin û ji bo wê pere komkirin



Hisên Çatikkaş

Bêguman gelek mijar hene ku mirov li ser binivîse û serê xwe pê re biêşîne. Lê mixabin zimanê êrîşkar ê rayedarên Tirkiyeyê pêşiya van mijaran digire. Ji lewra jî ez ê di vê nivîsê de li ser zimanê êrîşkar ê rayedarên dewletê binivîsim. Bêguman ev zimanê êrîşkar ê rayedarên dewleta tirk li hemberî kurdan her tim li ser kar bû. Lê ji ber ku pêvajoya aştiyê heye, zimanê wan ê êrîşkar bêhtir li ber guhê me dikeve. Ji ber ku rayedarên dewletê vî zimanê qirêj bi kar tînin, bêguman civaka Tirkiyeyê jî bikaranîna vî zimanê qirêj û êrîşkar wekî mafekî ji bo xwe dibîne. Mirov kîjan hesabên medya dijîtal ên nijadperestên tirk bimeyzîne, mirovê bibîne ku li kurdan heqaret an jî dijûn kirine. Ev yek êdî bûye ji rêzê û rojane. Bêguman ev zimanê li dijî kurdan ji avakirina dewleta tirk heta roja îro kêm nebûye. Lê bi çalakbûna medyaya dijîtal re ev yek bêhtir dîtbar bûye. Ango êdî zimanê êrîşkar û qirêj ê rayedarên dewleta tirk bûye zimanê kolektîf ê civaka tirk. Ji ber ku avakirina dewleta tirk heta roja îro heman heqaret û bêrûmetkirina kurdan li hemberî kurdan weke neqaratên stranan di devê hemû rayedarên dewleta tirk de dubare dibin. Di encama dubarekirina van heqaretan de kolektîfbûna civakê zêde bûye û gihîştiye asta herî jor.

Ji ber ku ev heqaret û bêrûmetkirina kurdan polîtîkayeke sereke ya rayedarên dewletê ye, ew ti carê kêm nebûne û her bêsiza hatine hiştin. Bêsizahiştina van heqaretan rêyên vî zimanê qirêj her tim vekirî hiştine. Hûn lê nemyzînin ku çend rayedar derdikevin û van kesan şermezar dikin. Ew bixwe di nav heqaretan de cihê xwe digirin û di bin simbilan de dikenin.

Ji ber ku ji avakirina dewleta tirk heta roja îro nasnameya kurdî tune hat hesibandin, heqaretkirin û bêrûmetkirina kurdan jî hêsan bû. Her wiha dema nasnameya kurdan hat qebûlkirin jî wekî pirsgirêkeke ewlehiyê hat dîtin. Lewra heqaretkirin û bêrûmetkirina nasnameya kurdî rewa hat/tê dîtin.

Jiberkirinên nijadperestên tirk li hemberî kurdan ti deman nayên guhertin. Bêguman ne tenê jiberkirinên nijadperestan, ên piranî tirkan li hemberî kurdan bi heman awayî ne. Li ser meseleyê hema hema hemû tirk dibêjin ku kurd fatûreyên ceryanê nadin. An jî dibêjin ku di her maça Amedsporê de marşa neteweyî ya tirkiyeyê tê protestokirin. Qalib û fikrên şaş ên li ser kurdan bi awayekî rêkûpêk tên fêrkirin û belavkirin. Li hemberî van agahiyên şaş jî rayedarek dernakeve û nabêje ku ev yek şaş e. Ango li ser van şaşiyan bêdeng dimînin, jixwe bêdengmayin di esasê xwe de erêkirin e.

Ji vî zimanê êrîşkar û qirêj ê rayedarên Tirkiyeyê bêhna serdestiyê difûre. Ji ber ku xwe serdest û kurdan jî bindest dibînin, mafê heqaretê di xwe de dibînin. Lewra li ser çand, ziman, nasname û dîroka kurdan çi tê ber devênwan texsîr nakin û vedireşin.

Wezîrê perwerdehiyê derdikeve û dibêje kesên bixwazin bila di qursan de fêrî kurdî bibin. Kîjan qurs wê têra zimanê 20 milyonî bikin? Jixwe ya kambaxtir parlemeterên CHPê derdikeve û dibêje ku ''li vî welatî gelê kurd tune ye''. Ji van mînakan jî diyar dibe ku partî û fikr ji dibe, nêzîkahiya nijadperestan li hemberî maf, hebûn û xwebûna kurdan bi heman awayî ye. Hemû amûrên îdeolojîk ên dewleta tirk xizmeta vî zimanê qirêj ê rayedaran dikin. Lewra di nav civakê de wekî zimanekî asayî û rewa tê dîtin. Li ser meseleyê siyasetmedarekî tirk di weşana zindî ya televîzyonên tirk de bêyî ku bifikire heqaretê li nasnameya civakên din dike û bi taybetî jî li kurdan dike, RTUK ti bertekan nîşan nade û ji nedîtî ve tê. Ev yek hêzê dide belavkirina vî zimanê qirêj.

Min di nivîseke xwe ya berê de nivîsandibû ku nijadperestî ne nexweşî ye. Bêguman ji van bûyerên dawî jî derket holê ku ev hevokeke rast e. Tirk nijadperestiyê bi dilxwazî dikin û vê yekê wekî polîtîkayeke serdestiyê bi kar tînin. Ji ber ku xwe serdest dibînin, lewra hesabiyetên tirk û tirkîtiyê esas digirin, berevajiyê vê hesabiyetên kurdan li ber çavan nagirin.

Heke li welatekî din bi awayekî kolektîf nasnameyek ji hêla siyasetmedarekî ve hedef bê girtin, bêguman partiya wî siyasetmedarî di demeke kurt de hemû rêbazên dîsîplînê dike meriyetê. Her wiha li welatên din nijadperestî bi awayekî zelal tê pênasekirin û wekî sûc tê qebûlkirin. Lewra bi awayekî hêsan kesek nikare nasnameya civakekê bi aşkere hedef bigire. Li Almanyayê nijadperest an jî Nazî bi awayekî aşkere nikarin xebatên nijadperest bikin an jî pesnê nijadperestiyê bidin. Lê belê nijadperestên Tirkiyeyê bi her awayî nijadperestiya xwe diparêzin û faşîzma xwe bi lêv dikin. Li ser meseleyê alîgirên Bursasporê li hemberî Leyla Zana zimanekî qirêj bi kar anî, lewra kurdan li hemberî vê bertek nîşan da. Li ser vê yekê ji CHPyan bigirin heta Zafer partiliyan piştgiriya xwe ya bi Bursasporê re aşkere kir. Dema mijar dibe kurd hemû partiyên siyasî li ser heman xetê kom dibin û kurdan wekî dijminên hevpar nîşan didin.

Bikaranîna vî zimanê qirêj li hemberî kurdan bêyî bê sizakirin her tim hat xelatkirin, li ser meseleyê piştî heqaretên Bursasporê, Bursaspor wekî qehreman hat îlankirin û ji aliyê gelek kesan ve ji bo Bursasporê pere hat komkirin û reklama sponsora Bursasporê bi awayekî aşkere hat kirin.

Di bikaranîna vî zimanî de pêvajoyeke demdirêj heye. Di bingeha vê de jî polîtîkayên bişaftin, tunehesibandin û înkarê hene. Bi vê yekê nasnameya kurdî tê krîmînalîzekirin û civaka kurdî bi awayekî kolektîf tê sizakirin. Ev yek ji rayedarên dewletê ber bi civakê ve tê kirin. Ango dewlet vê yekê bi zanebûn û bi hişmendiyeka hevbeş dike. Lewra heke rayedarên dewleta tirk naxwazin ku kurd ji dewleta Tirkiyeyê veqetin, divê di serî de zimanê xwe û civaka xwe yê di derheqê kurdan de biguherînin. Ji bo vê jî ji perwerdehiyê bigirin heta televîzyonan hemû amûrên xwe dixin bin xizmeta zimanê wekhevî, aştî û demokrasiyê. Heke vê yekê nekin wê ti carê kurd dewleta Tirkiyeyê qebûl nekin.




Salih Keleş

# Kurd bi serokê xwe re gihiştin hebûnê

Li gerdûnê her tiştek wateyeke xwe heye. An jî ew tişta li gerdûnê biwate ye. Ev yek jî vê rastiyê derdixe holê ku wate bi hebûnê pêk tê. Tişteke ku tune be wateya wî/ê jî çênabe. Wê demê şertê wateyê yê yekemîn hebûn e. Ku hebûn û wate derdikevin holê hewcedarî bi pênaseyekê dibînin. Wate û pênase ji hev cuda ne. Hebûna gerdûnê û ew tiştên ku gerdûnê ava dikin, pergal û hevsengiya di navber wan de gelek tiştên ku pênaseya wan li cem însanan tune be jî, li nav pergala gerdûnê wateyek wan heye. Yanî însan wisa hakimê her tiştî an jî di zanebûna her tiştî de nîne ku bibêje tişta ku pênaseya wî/ê li cem min tune be, ew tişt tune ye.

Di nav pergala gerdûnê de însan jî perçeyek ji gerdûnê ye (gerdûn bixwe nîne perçeyek ji gerdûnê ye). Her zindiyek an jî parçeyeke di nav gerdûnê de bi serê xwe hebûnekê ava dike. Her hebûnek jî di nav pergala gerdûnê de digihîje wateyê. Yanî her hebûnek bi serê xwe ne tu tişt e. Di nav hebûna gerdûnê an jî tiştan de dibe tişt, yanî digihîje wateya xwe.

Însan jî perçeyek ji gerdûnê ye. Di nav pergala gerdûnê de çavê xwe li dinyayê vedike. Destpêka însan di nav xwezayê de bi zindiyên din re dijî. Wê demê zêdetirê hînbûn û jiyana însan bi teqlîtê pêk tê (niha jî em zarokan çavdêrî bikin hemî hînbûnê xwe bi teqlîtkirinê dikin). Piştî demekê guhertinên bingehîn di gerdûnê de çêdibin. Ev guhertin bandora xwe li ser jiyana gelek zindiyan dike. Hinek cure zindî ji holê radibin. Ew zindiyên ku di jiyanê de mane jî li gor şert û mercên demê guhertin û veguhertin di xwe de pêk aniye wisa jiyana xwe berdewam kiriye.

Însan jî bi avakirina civakbûnê di nav gerdûnê de jiyana xwe berdewam kiriye. Destpêka jiyana civakî bi şêwaza zindiyên derdora xwe an jî xweza taqlîtkirin bûye. Bi demê re rêgeza jiyana însanan bûye civakbûn. Bi civakbûnê re bûye hebûn yanî însan. Însan jî bi civakbûna xwe di nav gerdûnê de dibe xwedî wate.

Li nav însanan jî bipêşketina zimanê remzî (sîmgesel) tarza hînbûna xwe ji teqlîtkirinê derbasî bixwe watedayînê yan jî hewldana gihîştina wateyê dibe. Ji vir û şûnde tişta ku dijî, wate li wê bar dibe. Jiyana xwe jî li gor hebûn û wateya xwe bi rêgez dike. Li gor wateya hebûna xwe şêwaza jiyana xwe diyar dike. Bi demê re ew tişta ku dijî pênaseyên wan tê kirin.

Têgihên li nav jiyana me pênaseyên jiyana civakî ne. Bi mînakeke şênber; însan bi şêwaza civakbûnê jiyaye piştre pênaseya sosyalîzmê lê hatiye kirin. Yanî bi jiyanê digihîje pênaseyê. Bi pênaseyê nagihîje jiyanê an jî wateyê. Ji bo însan tişta herî girîng awayê jiyanê ye. Ew civaka ku şiklê civakî dijî û agahiya wan têgiha sosyalîzmê tune be, marksîstên dema me gelo wê civakê çawa pênase bikin? Civak, niha ji wan marksîstan re çi dibêje hûn dizanin? Civak, niha meseleya koçer û mele wan re dibêje...(ew marksîstên ku ez dibêjim eleqeya wan bi tu awayî Marks û sosyalîzmê re tune ye).

Ew kesên ku li ser zeviya azadiyê tovê xwe çandibe zû an jî dereng, wê berhema azadiyê jê werbigirin. Lê tu di zeviya desthilatdariyê de bixwazî tovê azadiyê bireşînî, berhema ku tu jê hildî wê azadî nebe.

Dê dîsa desthilatdar be. Ji bo ku mirov hin tiştan bi hev bide fêmkirin divê ew zemîna ku mirov lê ye heman zemîn be. Ku wisa nebe wate û pênaseyên me jî wê cuda bibin. Ew kesên ku ji gotin û gavên Rêber Apo fêm nakin, bila zeviya ku lê ne mêze bikin.

Civaka kurd bi rêberê xwe re dîsa gihişt hebûn û wateya xwe. Kesên ku tehma azadiyê nizanibe dê ji vê hevokê fêm neke. Lê exlaqê sosyalîst an jî şoreşger ew e ku divê destpêkê hewldana fêmkirinê hebe. Gelê kurd jî rêbaza rêberê xwe ji bo xwe esas digire. Guh nade gotegotên ku civakê bi paş ve dibin. Li gor nexşerêya xwe tevdigere, rojeva xwe ew bixwe diyar dike. Rojeva gelê kurd jî azadiya Rêber Apo ye.



Xweşkanî
Felemez Ulug

# Hêviya sala nû

Sala 2025an ji bo kurdan bû saleke ku lêgerînên çareseriyê û zextên herêmî di heman demê de gihîştin lûtkeyê. Di bin bandora şerên li Rojhilata Navîn û guherîna hevsengiyên cîhanî de, kurd careke din bûn aktorên herêmê yên sereke.

Sala 2025an, rewşa her parçeyê Kurdistanê her çiqas ji hev cuda be jî, di mijarên giştî de mesele yek bû. Li bakurê Kurdistanê di bin bandora krîza aborî û nîqaşên li ser "pêvajoyeke nû" de derbas bû. Tevî zextên siyasî, vîna gel a ji bo aştiyeke rûmetdar û çareseriya demokratîk bi hêz ma. Li Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî tevî gefên derve û êrişên li ser binesaziyê, Rêveberiya Xweser sîstema xwe ya demokratîk parast. Pêwendiyên dîplomatîk ên bi hêzên navneteweyî re û naskirina statûyê bûn mijarên sereke. Hevdîtinên bi hikûmeta Şamê re jî yek ji mijarên herî girîng bû ku di tavahiya salê de hat nîqaşkirin. Li başûrê Kurdistanê pirsgirêkên navxweyî yên di navbera partiyan de û pêwendiyên bi Bexdayê re berdewam kirin. Parastina statûya federal li hemberî destwerdanên herêmî di rojevê de bû. Li gel vê, avanekirina hikûmetê hêviyên gel ên ji bo partiyên siyasî bi dawî kir. Li rojhilatê Kurdistanê piştî serhildanên "Jin Jiyan Azadî", tevgera civakî ket qonaxeke nû ya rêxistinbûnê. Kurd li vê derê bûn pêşengên guherîna demokratîk li seranserê Îranê.

Banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji bo "Aştî û Civaka Demokratîk" di sala 2025an de wekî rênîşanderekê hat dîtin. Ev bang ne tenê ji bo aliyekî, ji bo hemû pêkhateyên Rojhilata Navîn hat kirin.

Vê bangê di nava civakê de daxwaza ji bo diyalogê zêdetir kir û bû yek ji hêviyên herî mezin. Bi taybetî gelê kurd bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk, fikra ku kurd dikarin bi gelên din re (tirk, ereb, asûr, ermen û hwd.) di bin banekî demokratîk de bijîn, zêdetir kir. Ev bang bû sedem ku dewletên herêmî neçar bimînin polîtîkayên xwe yên şer ji nû ve binirxînin, her çend gavên pratîkî hîn kêm bin jî em dikarin bêjin ku vê bangê siyaseta hereme ji nû ve diyar kir.


Ji bo ku kurd di siyaseta Rojhilata Navîn de bibin xwedî hêzeke stratejîk û di sala 2026an de divê destkeftiyên xwe biparêzin.

Ji bo vê jî yek ji xalen herî girîng Yekîtiya Neteweyî ye. Pêwîst e kurd di navbera xwe de li ser stratejiyeke hevpar a neteweyî li hev bikin. Nakokiyên navxweyî destê dijberan bi hêz dike. Ji bo vê pêwîstî bi dîplomasiya piralî heye. Divê kurd ne tenê bi hêzên mezin re, lê bi gelên herêmê û saziyên sivîl ên navneteweyî re jî têkiliyên xwe xurt bikin.

Bêguman ev bêyî hêza aborî û xwerêveberiyê nabe. Sala 2026an, avakirina aborîyeke serbixwe û xurt, wê kurdan li hemberî dorpêçan biparêze. Vê yekê bi pêşxistina modela "Neteweya Demokratîk" li Rojava û Bakur, dikare bibe mînakek ji bo çareserkirina krîzên li Sûriye û Iraqê.

Weke encam em dikarin bêjin ku sala 2025an nîşan da ku kurd êdî naxwazin bibin "mexdûrên dîrokê", lê dixwazin bibin "avakerên paşerojê". Heke di sala 2026an de bi hişmendiyeke neteweyî û bi rêbazên demokratîk tevbigerin, wê statûya kurdan li herêmê bi awayekî qanûnî û siyasî bêhtir bê qebûlkirin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi banga 'Aştî û Civaka Demokratîk' bingeha vê danî. Êdî dimîne ku tevgerên kurdistanî li ser vê bingehê têkoşînê mezin bikin. Şert îro li gel kurdan in ku bikaribin dawî li neheqiya li wan tê kirin bînin. Bi hêviya ku sala 2026an bibe sala aştî, wekhevî û azadiyê. Ji niha ve sersala we pîroz be!



Hesen Huseyîn Denîz

# Divê kurd bi ser bikevin

Li Rojavayê Kurdistanê rojên girîng tên jiyîn. Pêdiviya gelê Rojava bi serkeftinê heye. Wateya serkeftinê dîtina çareseriyeke domdar û mayinde ya bidestxistina mafên gelê kurd ên bingehîn e. Ev maf çi ne? Di serî de mafê misogerkirina jiyanê ye. Jiyana gelê kurd hîn jî di bin xetareya mirin, girtin û sirgûnkirinê de ye. Ji aliyekî ve dewleta tirk, ji aliyekî ve hikûmeta Colanî û çeteyên tev lê bûne her roj gefa tinekirinê li gel dixwin.

Du kurdên xwefiroş hatine Şamê, li ser xwîna kurdan bazarê dikin û dixwazin koka kurdan biqelînin. Ewil we eslê xwe înkar kiriye, we li kurdbûna xwe xiyanet kiriye û we ji xwe re gotiye 'tirk'



Roja terorîstên DAIŞê hatin Rojhilata Navîn û êrîş birin ser kurdan, divê kurd rabin û rûnên û dua bikin, ku hêzeke wan a birêxistinkirî ya çekdar hebû û li Kobanê pişt li wan cinawiran şikand û gelê kurd ji qirkirineke berfireh parast. Ji bo wê hebûna hêzeke çekdar a kurdan pir girîng e. Divê kurd baş zanibin ku roja li Rojava çekên xwe deynin, hîn şev nebûye sibeh wê ji her çar aliyan ve çete û terorîstên bi ser Tirkiye, Sûriye û Îranê ve êrîşî malên kurdan bikin, ên bi dest bikevin bikujin, ên bifilitin wek xenîmet ji xwe re bibin û li bazaran wek kole bifiroşin, mal û milkên kurdan jî talan bikin.

Niha tişta dewleta tirk ji kurdên Rojava dixwaze ev e: "Xwe bêçek bihêle, bila çeteyên xwînxwar werin te tune bikin û tirk û tirktî bijî." Çima tu dixwazî kurd bimirin û tune bibin? Li şûna wê dawî li vê tirktiya xwînxwarê gelan bîne û wê tune bike, da ku gelên li herêmê û cîhan tev hilmeke xweş bistîne.

Tirktî bûye bela serê vî qirnê 21ê. Li ku derê tevliheviyek hebe, tiliya dewleta tirk tê de ye. Serokê artêşa Lîbyayê vexwandin û di rê de dan kuştin. Bahçelî bixwe dibêje, guman di vê ketinê de heye. Wateya wê ev e: Tiliya dewleta tirk tê de heye.

Hakan Fîdanê serokê Saziya Îstixbarata Millî (MIT), kirin wezîrê derve yê Tirkiyê, ku qaşo li cîhanê ji bo dewletê karûbarên dîplomasiyê bike. Lê biqasî diçe Şamê, ewqasî naçe nav  mala xwe. Çi îşê te her roj li Şamê heye? Çi roja were Şamê jî, çeteyên bi ser Tirkiyê ve yan wê li Helebê, yan li dor bendava Tişrînê, yan li ciyekî din êrîşî destekeftiyên kurdan bikin û ew ê jî bi hewtehewt bibêje "Divê kurd xwe bêçek bikin."

Bila dewleta te xwe bêçek bike. Ma ne hûn dixwazin kurd bi we re li hev werin û dest ji çekan berdin, wê demê fermo hûn jî çekên xwe kêm bikin. Leşkerên we yên Kurdistan dagir kiriye bi paş ve vekişînin. Heta doh we digot, Beşar Esad zilmê li gelê xwe dike û we ew ji xwe re kiribû neyar. Niha zilamê we bermayiyê DAIŞê hat ser şiyandariyê (desthilatdariyê), her roj hûn hev hembêz dikin, maç dikin, pişta hev miz didin, wê demê desthilatdariyê bispêrin hevalbendê xwe û ji axa Rojava leşkerên xwe derxînin. Na! Tê hem pişta Colanî miz bidî û hem Rojava dagir bikî û hem ji kurdan bixwazî çekên xwe berdin û xwe bikin leşkerên Colanî.

Du kurdên xwefiroş hatine Şamê, li ser xwîna kurdan bazarê dikin û dixwazin koka kurdan biqelînin. We xêr e? Destpêkê we eslê xwe înkar kiriye, we li kurdbûna xwe xiyanet kiriye û we ji xwe re gotiye 'tirk'. Yanî tirkbûna we sexte ye, xweînkar e. Ji bo wê jî dijminatiya we ya bi qewmê we re dijwar e, tûj û hişk e. Ji bo li nav civaka tirk bikaribin cihekî ji xwe re çêbikin, di dijminatiya kurdan de dikevin pêşbirkê. Îbrahîm Kalin ji aliyekî ve, Hakan Fîdan ji aliyekî ve rêya Şamê kiriye pîkola garanê. Sedem? Bila kurd xwe bêçek bikin? Çima? Ji bo çete bikaribin bi hêsanî qira kurdan bînin. Ji bo çi? Gava kurdbûn nemîne wê tirkbûn xurt bibe. Ji bo wê kurdan bêçek bikin, qir bikin, tune bikin, bêmaf bihêlin, da ku tirkbûn xurt bibe. Stratejiya dîplomasiya Hakan Fîdan û dewleta tirk ev salek e, li ser vê yekê tê birêvebirin.

Ew bixwe rojane bi Îsraîlê re, bi Amerîkayê re, bi Rûsya re, hema bêje bi herkesî re di nav diyalog, danûstandin, bazirganî û têkiliyan de ne. Lê eger dewletek ji cîhanê silavekê bide kurdan, qiyametê radikin û kurdan bi hevkariya wê dewletê tawanbar dikin û dixwazin li ber çavên gelê xwe xerab nîşan bidin. ''Weyyy çima kurd xwe nêzî Îsraîlê dikin?'' Ê bazirganiya te ya bi Îsraîlê re bi milyar dolaran e. Ew ji bo berjewendiya Tirkiyeyê ye û dikare bibe, lê divê kurd nekevin nav vê têkiliyê, da ku bê pişt bimînin. Mînakên wiha bêsînor in.

Ger îro li Rojava aramî çênabe, sedema sereke dîplomasiya nijadperestî ya dewleta tirk e. Divê dewleta tirk dev ji vê dîplomasiya qirêj berde. Tu yê rabî ji bo Qibrisa ku te ew dagir kiriye çareseriyeke dudewletî bixwazî, lê xweseriya li Rojava ji bo xwe wek xetareya mirin û mayinê bi nav bikî. Bi kurdî dibêjin, "Diya te çima sê çar zarokên din wek te wisa qurnaz çênekirine?" Çima her tişt ji we re mubah e, çima ji kurdan re guneh e?

Kurd wê bibin xweser jî, kurd wê azad jî bibin, kurd wê bibin serbixwe jî, kurd wê bibin xwedî çek û firoke jî, kurd wê bibin xwedî pergal û serwer jî û tu jî dixwazî biteqe û dixwazî serê xwe li dîwaran bixe!!! Ev kurdên niha ne ew kurd in ku te şandin Lozanê, vê yekê êdî ji bîr bike. Li Bakur; divê tu zagonên hebûna kurdan red dikin biguherînî û ji hebûn û mafên kurdan re rêzdar bî û vê yekê bi zagonên nû misoger bikî.

Li Rojava; divê tu destê xwe yê bixwîn ji wir bikişînî, her roj wek pîra gazindokî nebezî neçî Şamê û giliyê kurdan li ber Colanî nekî. Colanî nikare xwe bi rê ve bibe, wê çawa kurdan bi rê ve bibe? Amerîka doh jê re got here Şamê li cihê Esad rûnê, ew jî çû rûnişt, sibe Amerîka dikare bibêje, ji wir rabe û ew ê rabe, wê demê tu yê çi bikî?

Ger hiş û aqil bi te re mabe, dev ji dijmintiya li kurdan berde, leşkerên xwe ji Rojava vekişîne, bihêle bila kurd xweser, azad û bêtirs li Rojava pergala xwe saz bikin, parastina xwe bi pêş de bibin û deriyan veke bi kurdan re dest bi bazirganiyê bike, danûstandina mirovî bi pêş de bibe. Ev sed salên te bi hovane derbas kirin li paş xwe bihêle û di vê sedsalê de bi kurdan re êdî dest bi têkiliyên mirovî bike. Bila kurd bi ser bikevin, ku tu jî ji vê serkeftinê nesîbê xwe bistînî, yan na êdî kurd jî wê nikaribin te ji têkçûna biharê rizgar bikin.

KESK 1995

2026 Pîroz Be

KESK 1995

Li tevahiya cîhanê çîna kedkar û karker ji bo jiyaneke mirovî têdikoşin. Di heman demê de di serî de gelê kurd, gelên din ên bindest ji bo azadiya xwe têdikoşin. Em di her şert û mercan de li cem gelan, çîna kedkar û karkeran e. Ji bo ku hemû mirov bi mafên xwe yên herî xwezayî yên mirovî û gerdûnî bijîn pêwîst e ev pergal û hişmendiya zordar bi dawî bibe. Bi hêviya rojên xweş, aram, azad ku her kes bi mafên xwe yên bingehîn ên mirovî bijî sersala 2026an pîroz dikin.

Konfederasyona Sendîkaya Karkerên Cemaweriyê (KESK)



Prof. Dr.
Abdulîllah Polat

# Aştî û pergala naskirinê

**Aştî ne dawî ye, pêvajoyek e. Ew her roj, bi her gotin, bi her guhdarî û bi her gava biçûk tê avakirin. Aştî şertê mirovahiyê ye. Aştî ne tenê ew şert e ku em dikarin bi hev re bijîn, lê bi hev re bi rêz û bi hêvî bijîn. Her wiha, aştî ne tenê bêdengkirina çekan, lê ew şert e jî ku jiyan dikare bi awayekî rastîn bidome**

Aştî ne tenê bêdengkirina çekan e û ne tenê şertê rawestandina pevçûnên çekdar e. Di gelek civakan de, bi taybetî li Tirkiyeyê, aştî pir caran bi şertê ku çek bêdeng bibin tê şertkirin, lê ev şert, bi tenê, ne şertê aştiya rastîn e. Aştî şertê ku jiyan dikare bi awayekî wekhev, bi rêz û bi qebûlkirinê bidome. Ew ji şertên jiyanê ye, ne ji şertên şer. Aştî şertê ku civak dikare bi dîroka xwe re rûbirû bibe, birînên xwe nas bike û şertên nû yên baweriyê ava bike. Bi bingehîn, aştî pêvajoyeke derûnî ye. Ew di nav mirov de dest pê dike û bi şertên civakî re bi pêş ve diçe. Bêyî guhertina dîtinê, bêyî guhertina şertên hestyarî û bêyî qebûlkirina rastiyên êşdar, aştî bi tenê dibe gotinek li ser kaxezê. Civakek ku birînên xwe li bin erdê veşêre, bi her guherîneke şertdar, wan birînan dîsa vedike. Ji ber vê yekê, aştî şertê ku mirov dikare bêtirs li ber dîroka xwe bisekine û bêje ku şertên neheq hatine afirandin û divê werin guherandin.

Bi sedsalan e ku barê vê pêvajoyê, bi awayekî şertdar, li ser milên kurdan hatiye danîn. Ji wan hate xwestin ku biguherin, bi şertê ku dewletê re li hev bin, dev ji zimanê xwe berdin û dîroka xwe bi çavekî din bixwînin. Ev ne şertên aştiyê bûn, lê şertên şertkirinê bûn. Siyaseta kevn a dewletê, ku bi awayekî kurt tê gotin 'bila hûn wek min bin' , şertê ku li ser înkarkirina cuda cudabûnan ava bû, şertên baweriyê têk birin. Civakek ku şertên xwe li ser şertkirina yên din ava dike, nikare şertên jiyaneke hevbeş bi temamî biafirîne. Aştî tê wateya naskirina nasnameyeke ku bi şert û mercan hatiye înkarkirin. Nasname ne tenê şertê gotinê ye, lê şertê ku mirov dikare bi xwe re bi rêz bijî. Naskirina nasnameya kurdî ew şert e ku kurd dikarin bi şertên wekhev beşdarî civakê bibin. Ev naskirin, şertê qebûlkirina ziman, çand, dîrok û şertên jiyanê ye. Bêyî vê qebûlkirinê, gotina aştiyê bi hêsanî dibe gotineke pûç.

Ziman di bingeha xwe de şertê rûmetê ye. Ziman amûrê nasnameyê, amûrê bîranînê û şertê girêdanê ye. Qedexekirin, şertkirin an jî şermezarkirina zimanekî, şertê şertkirina mirovan e. Ji ber vê yekê, gava ku tirkek hewl dide fêrî kurdî bibe, an jî bi tenê bi peyvên bingehîn silav dide, di rastiyê de di nav xwe de peyameke mezin dihewîne. Ev peyam wiha ye: tu têyî dîtin, tu têyî naskirin û zimanê te rûmet e. Ji bo gelek kurdan, ku bi sedsalan neçar bûne zimanê xwe veşêrin an jî bi tirs bi kar bînin, ev gava biçûk şertê vegerandina rûmetê ye. Ji ber vê yekê ye ku kêfxweşiya ku li ser rûyê mirovan xuya dibe dema ku bi kurdî têne silavkirin, ewqas bi hêz e. Ev kêfxweşî ne tenê encama têkiliyeke zimanî ye, encama wê şertê ye ku mirov bi rûmet tê naskirin.

Lê di heman demê de, ji aliyê kurdan ve jî pêdivî ye ku ziman wek hêzeke yekîtiyê were dîtin. Ziman ger bi awayekî şertdar were bikaranîn, dikare ji amûrê azadiyê bibe amûrê qirkirinê. Cudabûna navxweyî ya şertdar, şertkirina zaravayan bi awayekî ku mirovan ji hev dûr dixe, ne ji bo feydeya ziman e û ne ji bo feydeya aştiyê ye. Rûmeta hemû zaravayan û qebûlkirina cûdabûnan, ew şert e ku ziman bibe hêza nêzîkbûnê. Aştî bêyî rûbirûbûna bi dîrokê re nayê avakirin. Dîrok ne tenê şertê bûyerên borî ye, lê şertê bîranîna kolektîf e jî. Bîranîna ku şertên îro û sibê jî ava dike. Gava ku dîrok tenê bi sernavên şertdar tê xwendin, trajediyên ku li bin wan sernavan veşartî ne, li bin erdê dimînin. Mirin, sirgûn, koçberiya zorî û jiyanên têkçûyî, bi şertên şertdar nayên jibîrkirin.

Xwendina nivîs û çîrokên nivîskarên kurd, ew şert e ku civak dikare bi pirsa bingehîn re rûbirû bibe. Bi salan e, ev heman pirs e: Kurd çi dixwazin? Bersiv, bi şertên cuda cuda, her tim li dor naskirin, mafên zimanî û çandî û hemwelatîbûna wekhev digere. Ev daxwaz, ne daxwazeke şertdar e, lê daxwazeke mirovî ye. Dema ku kurd çîrokên xwe vedibêjin, pirî caran ew bi dengê kêm diaxivin. Ev ne ji ber ku ew gotinek tune ye, lê ji ber ku bi salan gotin şertdar bûye. Gotin carinan sedema cezakirinê bûye û carinan jî sedema tirsê. Ji ber vê yekê, şertê aştiyê guhdarîkirin e. Guhdarîkirin, ne şertê bersivdanê ye, lê şertê ku mirov dikare bêje ez dixwazim fêm bikim.

Yek ji gavên herî dijwar, lê herî pêwîst, nasîna îmtiyazê ye. Ji bo gelek tirkan, şertên jiyanê yên wan wek tiştên normal xuya dibin. Lê ev normaltî, ji bo gelek kurdan şertdar e. Nasîna vê îmtiyazê şertê ku mirov dikare berpirsiyariyê bigire ser xwe û şertê avakirina hevsengiyek rastîn e.

Ev şert tev bi yekîtiya kurdan ve girêdayî ne. Civaka ku li ser daxwazên xwe ne yekgirtî ye, bi hêsanî tê şertkirin. Yekîtiya li ser bingehên bingehîn, şertê dengê civakê bihêz e. Ev yekîtî, ne şertê şertkirina cudabûnan e, lê şertê ku li ser wan bingehên hevpar şertên nû yên jiyanê were avakirin.

Aştî ne dawî ye, pêvajoyek e. Ew her roj, bi her gotin, bi her guhdarîkirin û bi her gava biçûk tê avakirin. Aştî şertê mirovahiyê ye. Aştî ne tenê ew şert e ku em dikarin bi hev bijîn, lê bi hev re bi rêz û bi hêvî bijîn. Herwiha, aştî ne tenê bêdengkirina çekan, lê ew şert jî ew e ku jiyan dikare bi awayekî rastîn bidome.



**2026**
**Pîroz Be**

**Bi sala ne wek dayik me êşên gelek mezin kişand.**
**Bi banga Aştî û Civaka Demokratîk a**
**Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hêviya me ya aştiyê xurt bû.**

**Em wek Dayikên Aştiyê hêvî dikin ku 2026 bibe sala aştî û aramiyê.**

**Serê sala we pîroz be.**

**Dayikên Aştiyê**

# Vera înkarî de heqîqetê kurdkî

Çi heyf ke vera kurdkî hêriş her ke şono zêdîyeno. Serekê Partîya Vatanî Dogu Perînçek vano: “No ziwan nêeşkeno bibo ziwanê huqûq û perwerdeyî” la yeno zanayene ke kurdkî wayîrê sîstemê perwerdeyî yo

| Lîzşêr Amed




Ziwan, tena silgirê têkilî nîyo; ziwan estbîyayîş, nasname û ruhê yew şarî yo. Tarîxê merdimayîye de, çinbiyayişê yew şarî bi çinbiyayişê ziwanê ci dest pêkeno. Seserra 21. de, dinya de heqê ziwanan sey heqanê bingeyîyan yenê qebulkerdiş, la ma vînenê ke welatê ma de hêrişê vera ziwanê kurdkî (Kurmancî û zazakî) nêqedîyayê. Rojdemê peyênî de, çi Mehkemeya Antalya de qedexekerdişê ziwanî bo, çi vatişê siyasetmedaranê sey Dogu Perînçekî bo, nê heme nîşan danê ke zîhniyetê înkarî hema zî dewam keno. Labelê, raştîya ilmî, tarîxî û edebî vera nê îdîayan de sey koyêkê berzî vinderde ya.

**Zîhniyetê qedexeyî: Antalya û Perînçek**

Hema nê rojanê peyênan de, Mehkemeya Antalya de yew dadgerî destûr nêda ke yew hemwelatîjî bi ziwanê xo yê dayîke qisey bikero. Dadgerî va: “Ti nêeşkenî tîya de kurdkî qisey bikerê.” No tewir, tena binpaykerdişê huqûqê merdiman nîyo, eynî wext de înkarkerdişê estbîyayîşê yew miletî yo. Heto bîn ra, serekê Partîya Vatanî Dogu Perînçekî yew beyanat da û va: “Kurdkî ziwanê perwerde û huqûqî nîyo, nêeşkeno bibo ziwanê medenîyetî.”

Na îdîa, ne ilmî ya, ne zî raşt a. Kesê ke nê tewir qisey kenê, yew raştîya gird a tarîxî û sosyolojîk nêvînenê. Înan gore ziwan, tena o wext “ziwan” o ke wayîrê yew dewlete bo. Labelê ilmê ziwannasîye wina nêvano. Yew ziwan, qudretê xo dewletbîyayîşî ra nê, xezînaya xo ya çekûyan ra, gramerê xo ra û edebîyatê xo ra gêno.

**Cewabê ziwannasîye û şahidê tarîxî**

Eke ma biewnîye tarîxê ziwannasîye, ma vînenê ke kurdkî û lehçeya ci ya qedîm zazakî, hetê profesor û ziwannasanê dinya ra sey ziwananê tewr dewlemendan ê herême ameyê qebulkerdiş.

Serranê 1850an ra heta ewro, zaf ziwannasanê rusan û almanan serê nê ziwanî xebatî kerdê. Înan ra yew Peter Lerch o. Lerch, hêna serra 1856 de gramerê kurdkî ser o xebatêka girde kerde û nîşan da ke no ziwan wayîrê yew sîstemê gramerî yê bêemsalî yo.

Badê cû, ziwannasê namdarî yê sey Oskar Mann û Karl Hadankî ameyî. Oskar Mann, 1900an de ame herêma ma, Sêwreg û Çewlîg de xebatî kerdî. Karl Hadankî, xebatê Mannî temam kerdî û serra 1932 de pirtûkê “Mundarten der Zaza” (Lehçeyê Zaza) çap kerd. Nê aliman bi delîlanê ilmîyan nîşan da ke kurdkî, ziwanêko xoser ê û sîstemê ci yê çekuyan zaf dewlemend o.

Ewro zî, profesorê sey Joyce Blau (Parîs ra) û Martin van Bruinessen (Hollanda ra) nê xebatan dewam kenê. Prof. Joyce Blau ke yew otorîteya dinya ya, vana ke “Edebîyatê kurdkî wayîrê yew kokê xurtî yo û no ziwan şeno heme tewir termanê felsefî û huqûqî îfade bikero.”

Eke Dogu Perînçek vano: “No ziwan nêeşkeno bibo ziwanê huqûqî”, ganî şêro pirtûkanê Prof. Qanatê Kurdoyî, xebatanê Terry Lynn Toddî û analîzanê Ludwig Paulî biko. Nê heme ziwannasî vanê ke kurdkî wayîrê yew sîstemê ergatîvî yo û no sîstem hetê îfadekerdişê hûrgilîyanê mantiqî ra zaf aver şîyo.

**Rolê Grûba Vateyî**

Tîya de ganî ma bale biancê serê xebata Grûba Vateyî. Nêzdîyê 30 serrî yo ke Grûba Vateyî seba standardîzekerdişê kırmanckî xebetîyena. Vateyî nîşan da ke no ziwan tena ziwanê keyeyî nîyo. Bi ferhengê Vateyî, bi kovara Vateyî û bi pirtûkanê ke nê standardî ser o nusîyayê, ewro ma vînenê ke zazakî de meqaleyê felsefî, huqûqî, tibbî û sosyolojîkî yenê nuştene.

Nuskar û cigêrayoxê sey Malmîsanijî ke ronayoxanê Vateyî ra yê, bi serran o ke nîşan danê ke zazakî eşkena bibo ziwanê perwerdeyî yê tewr berzî. Eke yew ziwan de şîîrê berzî bêrê nuştene, eke yew ziwan de termê modernî bêrê viraştene (sey ke Vate keno), o wext o ziwan eşkeno bibo ziwanê huqûqî zî. Huqûq mentiq o, û zazakî zî ziwanêko tewr mentiqîyan ra yew o.

Mesela, Dogu Perînçek û hemfikrê ci vanê ke “terimê huqûqî çîn ê”. Labelê ferhengê Vateyî de hezaran çekuyê ke têkilîya xo bi îdare, qanun û dadgeh estê. Vateyî nîşan da ke ziwanê ma, sey ziwananê bînan ê Hînd-Ewropa, wayîrê potansiyelêko bêemsalî yo.

**Kurdkî ziwanê perwerdeyî yo**

Perînçek û zîhniyetê qedexekerdişî vanê: “Kurdkî nêbena ziwanê perwerdeyî.” Labelê nê kesî nêzanê ke serranê 1890an de, Ehmedê Xasîyî “Mewlûdê Kirdî” nuşt. O wext, Amed de matbaa estbî û no pirtûk hetê dewleta Osmanî ra destûr girewt û çap bi. Eke 130 serrî verê cû no ziwan bi şeklêkê kitabî ameyêne çapkerdiş, gelo ewro senî nêbeno ziwanê perwerdeyî?

Zanîngehanê dinya de, sey Zanîngehê Sorbonne, Zanîngehê Exeterî û Zanîngehê Frankfurtî de kursîyê kurdkî estê. Akademîsyenê dinya, bi nê ziwanî tezê doktora danê. Gelo nê heme profesor û zanîngehanê dinya şaş ê, la tena dadgerê Antalya û Dogu Perînçek raşt ê? Ne, raştîya ilmî aşkera ya.

**Ziwanê ma estbîyayîşê ma yo**

Hêrişê ke ewro vera kurdkî de yenê kerdene, nêeşkenê tîrojê heqîqetî binimnê. Ziwanê ma, estbîyayîşê ma yo. Heta ke ma bi ziwanê xo binusê, biwanê û domananê xo rê bimusnê, hukmê çewî nêeşkeno ma çin bikero.

Dogu Perînçek û zîhniyetê qedexekerdişî wa baş bizanê; yew ziwan ke bi hezaran serran o Koyanê Munzurî, Sîpan û Cûdî de ciwîyeno, bi qerarê yew mehkeme an zî bi vatişê yew siyasetmedarî nêmireno. Zazakî, bi eser û roşnvîranê xo, do bibo ziwanê huqûq, perwerde û medenîyetî. Tarîx şahid o, ilm şahid o, û ma şahid ê. Ma do bi serebrzî ziwanê xo qisey bikerê û bipawê.

---



Mamoste Silêman

# Sûrîye û Tirkîye de aşîtî



Mîyanê Mazlûm Ebdî û Serekê demkî yê Sûrîye Ahmed El Şara de yew mutebaqat îmza bîbo zî hêzê Hukmatê Demkî û hêzî ke gireydaye yê Tirkîye yî hêrişanê xo dewam kenê.

Hetan eyro bi hezaran elewî û durzîyî qetil kerdê. Hima zî nê hêrişanê xo de israr kenê. Ahmed Şara wexto ke Amerîka ra, Ewropa ra û dewletanê ereban ra destek gêno, nêwazeno ke DSG reyde diyalog virazo. Mesela wexto ke hêrişê elewîyan kerd, Dinya ra yew bertekêko pîl dîy, no bertekî dima DSG reyra dekewto tekilî. Dima zî wexto ke Durzîyî qetlîaman ra vernayê, rayna dinya de yew tepkî dîy û DSG reyra dekewto tekili. Nê rojan de zî Palmîra de yew elemanê asayîşî yê Wezaretê Zerrîyî yê Sûrîye, gala leşkeranê Amerîka kerd, di leşker û yew sivîl tede hîrê hemwelatîyê Amerîka qetil kerdê. No hedîseyî ser o, ko rayna tepkî veyno û DSG reyra bidekewo têkilî.

Ordûyê Sûrîye mîyan de, bi desan rêxistinî estê. Nê rêxistinan mîyan de DAIŞ'î zî estê. Xo ra no hedîseyo peynî de elemanê DAIŞ'î, hîrê amerîkayijî kiştê. Nê DAIŞ'an, nê serranê verînan de sereyê merdiman derra kerdinê, merdimî ganî-ganî veşnaynê. Tewr zaf kurdî qetil kerdê. Ciniyê kurdan remnaynê, tecawuzê înan kerdinê û pazaran de rotinê. Nê merdimî goniya kurdan firbikerê mird nêbenê. Yew qala verênanê ma esta, vanê ke; “Mela çuwa nêdekewo korî dest.” Eke eyro zî firset veynê, rayna ko qetlîamanê xo dewam bikerê. Ma kurdî, înan zaf baş nas kenê, eke yewerî qetil nêkerê, ko yewbînan qetilbikerê. Şewa tarî şan ra bellî ya. Nê merdimi; heq û huqûqî ra, edaletî ra, aştî ra çîy fam/fehm nêkenê. Na ra binê Hukmatê Sûrîye de, yew zemêno sermitikin/şemitok esto. Na rewşe de, cuyê Ahmed Şarayî zî emnîyet de nîyo.

Ahmed Şara tede, heme kadroyê Hukmatê Sûrîye û ordûyê Sûrîye, kulturê demokrasî ra dûrî yî. Xo vêşêr yewerî qebul nêkenê. Ferasetê înan, firêzeyê/kerdeyê înan ra bellî yo. Mesela orduyê mîyan de, dayîreyanê Dewleta Sûrîye de, ciniyan qebul nêkenê. Bi nê ferasetî, Sûrîye de huzur serê xo nêgeno. Aye ra tek yew rayîr maneno. No rayîr zî; kurdan, durzîyan û elewîyan û mûxalîfanê Sûrîye reyde pêamîyîş o.

Yewna het ra mîyanê Hukmatê Sûrîye û Îsraîlî de nakokî esta. Dewleta Îsraîlî, bawerîya Hukmatê Sûrîye nekeno. Na ra xo rê yew herêmo tampon awan kerdo. Eke Hukmatê Ahmed Şara SDG reyra pê bêro, Îsraîl zî ko nê hêrişanê xo ra fek verado. Eke yew Sûrîyeya demokratîke awan bibo mîyanê Sûrîye û Îsraîlî de şer qedîno.

Kurdî xoserî wazenê, semedo ke bi heqanê xo yê xozayî biciwîyê, bi qanûnê bingeyî teminat wazenê.

DSG wazena ke, fermandarîya xo, bi no halê xo yê mewcûdî de bikewo binê Wezaretê Pawûtoxîyeya Sûrîye. Kurdî, Rojava de zî îdareyê Otonomî wazenê. Goreyê ma zî Sûrîye de, kurdî tede, durzî, elewî û şarê bînî, ancax bi yew xoserîya demokratîke û bi qanûnê bingeyî azad benê. Tersê ey de, şaran mîyan de seyyewbînanî înşa nêbena.

Dewleta Tirkîye zî hetan eyro PKK bahane kerdinî û meseleya kurdan çareser nêkerdinî. La nika no bahane zî nêmendo. PKK fek çekan ra verradana û wazena ke zemêno demokratîk de sîyaset bikero. Xora na ser o, Meclîsê Tirkîye de, yew Komîsyon awan bîyo. Nê komîsyonî, terafan reyra pêveynayîşî/dîdarîyî kerdê. Nê rojan de partîyê sîyasîyî zî raporê xo hedre kenê û teslîmê Komîsyonî kenê. Dima zî Komîsyon ko raporê xo hedre bikero û teslîmê Meclîsê Tirkîye bikero. Dima zî Meclîsê Tirkîye, ganî rolê xo kaybikero, semedo ke na mesela kok ra çareser bibo, ganî qanûnanê aştî û demokrasîyî vejo.

La aseno ke Dewleta Tirkîye, nêwazena ke kurdê Sûrîye wayîrê yew statuyî bibê. Na ra Dewleta Tirkîye wazena ke, sey yew şertê pêameyîşî, DSG çekanê xo teslîmê Hukmatê Ahmed Şarayî bikero. Kurdan vera DAIŞ'î yew têkoşîno zaf bi bedel dayo. Na rewşa Sûrîye de û nê şertan de, no waştişê Dewleta Tirkîye, yew waştişêko maqûl nîyo. Dewleta Sûrîye, yew leteyê Dewleta Tirkîye nîya. Eleqeyê pêameyîşê Tirkîye û yê Sûrîye çino. Na zî eşkera ya ke eke Tirkîye de aşîtî serê xo bigêro, kurdî Sûrîye zî vera xo tadanê Tirkîye. Çunku Tirkîyeyêka demokratîkê, şaranê Rojhilatê Mîyanênî rê bena sey model. Na cografya de zaf gonî bila bîya. Na seserre de, kurdan û şaranê Rojhilatê Mîyanênî, qet yew huzur nêdîyo. Rojhilatê Mîyanênî de, şer yew qeder nîyo.

Eke Tirkîye de û Sûrîye de yew aştî înşa bibo, Rojhilatê Mîyanênî de ko bi temam şer biqedîyo û yew dewro newe dest pêkero.

2026
# Pîroz Be

**Li cîhanê bi rojan mafên mirovan ên herî xwezayî tên binpêkirin. Di sedsala 21an de pergala wiha ji hêla me ve bi tu awayî nayê pejirandin. Ji bo dawî li binpêkirina mafan bê û ji bo ku her kes bikaribe bi mafên xwe bijî em ji erk û pêywira xwe ya mirovî gav paş ve neavêjin. Ji bo ku her kes bikaribe jiyaneke biaram, azad û xwedî stargeh bijî wekî do îro jî em lê pêy mafên mirovî ne. Bi hêviya ku sala 2026 bibe sala avakirina Aştî û Civaka Demokratîk. Em sala 2026an li hemû gel û baweriyan pîroz dikin.**

tmmob

Lijneya Koordînasyona Bajar a Yekitiya Odeyên Avahîsaz û Endezyarên Tirk a Amedê

# BILA 2026 BIBE SALA AŞTÎYA MEZIN Û LIHEVKIRINA DEMOKRATÎK

Em bi biryar in ku barên civakî yên sala borî, bi hêvîya teze ya sala nû û bi hêza çareserîyê ya sîyaseta demokratîk derbas bikin.

Em sala 2026an bi perspektîfa Aştî û Civaka Demokratîk; wekî dest-pêkeke nû silav dikin ku tê de ne şer, lê aştîyeke bi rûmet serdest e.

Di sala nû de erka me ya herî bingehîn; pêkanîna wê yekê ye ku gel li ser bingeha hevwelatîbûna wekhev di pêşerojeke hevpar de bigihîjin hev.

Em ê ji bo avakirina civaka demokratîk, pêşengîya sîyaseteke wisa bidomînin ku lihevkirina civakî esas digire, kanalên dîyalogê mezin dike û îradeya gel pîroz dibîne.

Bi yekîtîya xurt a gelan û bi hesreta wan a dîrokî ya ji bo aştîyê, em ê Sedsala Duyemîn bi serkeftina demokrasîyê tacîdar bikin.

Em sala nû ya hemû gelên xwe bi daxwazên herî ji dil pîroz dikin; em hêvî dikin ku sala 2026an aştî, aramî û azadîyê bîne.




www.demparti.org.tr iletisim@demparti.org.tr DEMGenelMerkezi

# xwebûn

29 Kanûn 2025 - 4 Çile 2026/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 315

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Mevlana Halit Mahallesi Turgut Özal Bulvarı Umut 2 Konutları A Blok 4/9 **Bağlar - Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85



DI SALA 2025AN DE

- Bingeha Projeya Qonaxa 2. a Tesîsa Paqijkirina Ava Vexwarinê ya Navendî hat danîn.
- Amadekariyên Kargeha Nanê Gel temam bûn.
- Bingehên Naturapark û Parka Mezopotamyayê hatin danîn.
- Tesîsa Civakî ya Fîskayayê ket ber xizmeta gel.
- Festîvala Fîlman a Amedê û Festîvala Şanoyê ya Amedê piştî 8 salan ji nû ve hatin organîzekirin.

Em ê bidomînin ku di xizmeta gelê xwe de bin.

2026

SERSALA WE

Pîroz Be

SERRA BUCAK | DOGAN HATUN

HEVSEROKÊN ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ | /diyarbakirbld

ALO 153